

Rojeke Jinan Taybetmend

Enehîte Mûrad

Di sala -1960î- de , li komara Eldomonîkey , hakumdarê komarê Refeyêl Troxêlêyo fermana kuştina hersê xwîşkan Mîrebêl , yên ku di warê mafên jinan de dixebitin. Bi rengê dirinde , hov û dûrî sincên mirovane didane kuştin . Piştî ew bûyera bi êş û jan tevger û rêxistinên jinên Cîhanê bêdeng nediman, herdem gilî û gazinên xwe hildidane encûmana Netewên yekigirtî . Loma jî , di -17-12-1999-an de , encûmana giştî ya navnetewî ya yekigirtî, di bin bend û biryara -54-134-an de , didît ku -25-ê çirya paşî, bibe rojeke Cîhanî taybet ji bo çareserkirina pîrsgirêk û ew rûdawên bive yên ku li ser jinê berdewam in . Digel diyarkirina encûmana yekigirtî, pêwîste hemû dewlet û rêxistinên fermî û yên ne fermî çalakiyên xwe di wê rojê de li dijî zorê û cidahiye geş bikin ,berê gel û xelkê bidine hişyarî û pejirandina mafên mirovan ! Mixabin li vê dawiyê rapora rêxistina tendurstî ya Cîhanî nîşan dide ku , %70 ji keçan û dora %80 jin dibine qurban. Salê bi milyonan jin têne (ixtîsab kirin). Heyf û mixabin ku , em di sedsala bîst û yekane de, hê jî ev rewşa nivê civakê bînpê û di tariyê de ye ! ? Vêca jî hema em dûr neçin, bi dilşewat û kurtebirîn li ser rewşa jinê di civaka Sûriyê de rawestin ,zor mixabin ku jin qurbana herî hêsan û erzan e. Biher awî ew tê ye xopandin û salê bi dehan di bin perda şeref û namûsê de têne kuştin û birîdarkirin , pir mal kavi û wêran dibin . Zor pêwîste ku em bînin zimên, paya jina Kurd ji ev rewşa ne mirovan e û kirêt diwartir e. Bi ser her tiştî de ,ew zor û lêdanan dibîne û ji her mafên mirovane bêpare. Her tişt li wê qedexeyê.

Lewre jî jina Kurd, di heyameke ne tendurist de, li ber xwe dide !? Ma gelo çiqas şerim û fediye ku , rejîma Sûriyê îmza xwe li pêş raya giştî xistiye binê lîsta mafên mirovan û xwedî lê dernakeve , civaka Sûriyê roj ji rojê, ji hevdu dişele rûdawên biv û bi tirs tê de serî hildidin .

Li dawî, gilî û gazinên me, li basikên Tevgera kurd li Sûriyê gelek in , ku bi erik û sitûbariyên xwe di warê civakî de ranabin. Mixabin, wan piştî xwe dane cvaka Kurd û şerê hevdu dikin !. Bêgûman ev yeka tu carî doza gelê Kurd li Sûriyê çareser nake, bila win li pêş raya giştî, li der û hundir, nemaze li pêş gelê Kurd rûreş dibin . Hêvî û armanca me ew e ku, win dev ji ezezi û şerê hevdu berdin .Bi biratî , soz û peyman, destên xwe bidin hevdu li doz û civaka xwe xwedî derkevin .

Berxikê kesk

Berxikê kesk , romaneke nû çap bûye û ronî dîtiye , nivîskarê wê mamoste **Azad Ehmed Elî ye** , ji (176) rûpel qetên orte pêk hatiye , zimanê wê zimanê Kurdî ye , û li sala (2008) an , bi alîkariya dezgeha **Sema Kurd** ya çand û hunerê , li weşanxana **Hîro li Dubey - Îmarat El- Erebiyê** hatiye weşandin .

Em komîta birêvebirîya Newrozê danerê vê berhemê mamoste Azad Ehmed Elî sipas dikin , berhema wî pîroz dikin , û rêza ked û cefayê ku wî di ber de dîtiye digirin . Herweha hêviya me ji xwendekarên zimznê kurdî ew e , ku wê bixwînin , belkîm di paşerojê de hinek ji wan xwêneran derkevin , wê ji aliyê zimên û naverokê ve bidin ber nîrxandina rexneweriyê .